# bûyer PRESS

Nûçe Bi ... Zelalî


Gotar û Lêkolîn

Vê gotarê bixwîn
Ibrahîm Xelîl
Rû.02

Hevpeyvîn


Sîrwan H. Berko
- ARTA FM Ne Radyoyeke Kurdan e...
Rû.03

Civak û Çalakî

BI PERÎSÊLKAN NIKARIN TENÊ BI ME KARIN!!
Idrîs Hiso
Rû.05


www.buyerpress.com buyerpress buyerpress buyerpress@gmail.com WhatsApp 00905368908545

Rojnameyek Sîyasî - Civakî - Çandî - Serbixwe - Nîvmehane | Hejmar / 03 / 01 - 09 - 2014 | Buhayî 50 P.S


## Her Sal Di 6ê Îlûnê De.. Dilê Me Ditevize. Deryaya "Îcê" Ne Eferim Ji Te Re…!





Rûpela pêşî ji rojnameya Bûyerpress bi sponseriya
GAZIYA MÎDIYA
Salih Gişti
راعي الصفحة الأولى صالح كشتي

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpress@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS Nûçe Bi ... Zelalî

# "Jûbîla Zêrîn" a Siûd El Mela


Hîm Umer

Xirecir û cimûcoleke bêsînor bûn para Siûd El Mela piştî hevpeyvîna wî berî çend hefteyekî li gel BûyerPress. Li çep û rast herkesî nerîna xwe anî ziman û hema bêje kesî xwe bêkar nehişt. Tiştê serincrakêş û daxdar di heman wext de ew bû ku ev gengeşe û karvedan weku her car di çarçeweyên bêteşe û bêhûde re derbas bû. Ji lojîk û belgeyan zêdetir hêrs û peroşî hatin dîtin. Bila guman nebe: bersîvên Siûd El Mela her mirovekî asayî û tendurust matmayî hişt û ew bi herhal naguncin li gel cihê wî wek nûnerê yekemîn ê hêzeke girîng li ser gorepana siyasî li rojavayê Kurdistan. Pirs li vir dimîne gelo bo çi Siûd El Mela wa kir û çi pêdivî hebû ku bi wî şêweyê kêm hişmend bersîva pirsan bide, nemaze ku wî taze pêşengiya partiya xwe wergirtiye û her peyveke ji devê wî di vê serdema hestiyar de dikare bandoreke xwe ya mezin hebe li ser tevaya bergeha siyasî ya kurd?! Şîroveya herî berdest û gengaz me vedigerîne koka tevgera siyasî ya kurd; ev tevgera ku her ji roja roj de nikarîbûye li erk û berpirsiyariyên xwe xwedî derbikeve û ne jî karîbûye gavine bihend û berdar biavêje daku bibe nûnereke hevseng û rasteqîn a doza rewa û mafdar a gelê kurd. Derencam: piştî 67 salan tevgereke dabeşbûyî, dawerivî û bêbandor li ber çavan diyar e; tevgerek ku ji çewtî berew çewtiyê ve diçe û ji kirîzekê derbasî kirîzeke dî dibe. Seranserî van 67 salan vê tevgerê bi hemû awayan rê li berdem nûkirin û pêşveçûna xwe girt. Ne tenê nifşê genc bi xwîneke sard hat piştguhxistin, li herweha jina kurd jî (nîvê civakê!) bi awayekî fanatîk û paşvemayî ji gorepana kar û xebatê hat dûrxistin. Tiştê bermayî, kurtêla kalemêran, di nav çemk û têgehên raserî asta têgihiştina wan de rê wenda kirin û ketin rewşeke nalebar û bêçare de. Bersîv û daxuyaniyên neberpirsiyara ne yên Siûd El Mela bo BûyerPress rasterê yek ji encamên vê rewşa aloz û bêhêvî ya tevgera kurd e. Ev yek li tenişta ku rewanbêjî û bijartina peyva rast û derbirîner rojek ji rojan nebûye derdek bo partiyên kurd û rêvebirên wan. Ji lewre tê pêşbînîkirin ku ev rewşa gelşdar dê ne ya dawîn be weku ku ne ya pêşîn bû jî. Sebarê vê çewtiya berçav a rêzdar El Mela û li şûna ku ew yan jî partiya wî li xwe vegeraya û dan bi kêmasiya xwe bianiya, hin nûnerên partiyê derketin pêşberî medya û ketin nav hewldanên veanîn û nikolîkirina wan daxuyaniyan û rûspîkirina sekretêrê xwe. Bi heman vê mentalîteya xemsar û xapîner, tevgera kurd li şûna ku nêzî derd û kulên gelê xwe bibe û di asteke payebilind de bibe berdevkê hêvî û awatên wî, mixabin ew roj bi roj gelektir dûrî erka xwe ket û bi yekcarî hemû rêz û rûmet, çi bo xwe û çi jî bo gel, ji dest da. Di dema dawî de, herçende, ev hevkêşiya nexweş û kulek hin bi hin li dawiya xwe rast tê. Kirîza diltezîn li Sûriyê û gef û hereşeyên ku di van çend salên dawî de li Kurdistan û Rojhilata Navîn rû dane, gelek kes hişyar kirin. Îro roj cemawerê kurd çaverêyî hêzekê ye ku bikarîbe bi şêweyekî berpirsiyarane li gel vê rewşa awarte bilive û gelê kurd ji metirsiyên mezin biparêze. Bi dilê me be yan na, ev bijarde halê hazir berdest bûye û rojane di xwîna pak a keç û lawên vî gelî de berceste dibe. Eger rêzdar El Mela û yên wî çavên xwe li vê rastiyê bigirin, ev kêşeya wan e. Lê bila baş bizanin ku êdî kes jûbîleke zêrîn a dî ji lasarî û helatina ji erk û berpirsiyariyan napejirîne.

# Rojnamegeriya Dema Îro


Ciwanê Ebdal

Wiha bi çend pirsên gulover qene em bikaribin bêjin ku piştî sed û pazdeh salan ji çapemeniya Kurdî çi beş li rastê heye, Ji pêvî rojnamegeriya hêzên konevanan, belavokên partiyan li gasînê digere. Ev belavokên bi çend rûpelan diafirin, tên civandin bi çelokî, ev partî nêrîna xwe yên taybet didin xuyakirin, û hêzên partiyên dî şaş dikin, mixabin giftûgoyan badîhewa dikin, û çendî xwendevanên wan hindik bûn û belava wan bi dizî belav dibûn, ji ber wiha suda xwe nedida tevayî, mirov dikare bê tirs bibêje: Navê belavokê partiyan lê bike, mixabin ew jî bi zimanê Erebî bûn.

Bi vî awayî çendekî pir hindik li vir, li hirêma Rojava (Sûrî) wiha bû. Van çende salên dawî, piçekî bihna xwe berda û bayê guhertinê rabû bi navê (nû-recîma cîhanî) li her derê belavbû û pê re giheştî herêma Kurdistanê jî bi kêmî. Çapemeniya rojnama îroj hîna serbixwe ye, an tu sazî li duve tune, ew ya deşta jîna me xemlandî ye, mîna çirîskek tariya me ronî dike, tevî naveroka wan, xwe bi van giringiyan mijûl dikin:

1- Ji ber holek mezin ji tore û çandê vala heye, derhênan û afirandin ji helbest, çîrok, gotar û sîminaran tê bikaranîn.

2- Stûnê wî konî jî ziman û rêziman e, ji ber hîn rêzimanek tevayî tune, û her yek bi zimanê herêma xwe dinvîse û dixwîne.

3- Beşek jê, ji gelpor û şopemayên filklorê xwe diçêre, ango şopemeniya gelêrî, ji dizî û ji wergerê diparêzin, ji qir û windakirinê.

Ev -bi rastî- ne her tiştên rojnamegeriya em li nav gelan wê dinasin, ma gelo çapemeniya kurdî digihêje tevaya gel bi giştî? pêpelokê civakî û qatên cemawer. Yan ji bilî pêşênkarê wî, yên konevanî, çandayî, û bi wan ve girêdayî ye û hew.

Kengî wê bibe li gorî hêvî û armancan,li gorî omîd û xweziyan navbera dewletan? li navbera miletên Kurdan an yên Kurdistan par kirine, bi sînor kirine perçe, bi desdariya şofînî û zordestiyê li gelê kurd dikin.

Bi konevaniya xwe, bi çanda xwe, bi sê-çar miletanê xwe, û sê-çar zimanê xwe jî, çi bi Erebî, Turkî, û çi bi Farisî jî, ma wê kengî çapemeniya Kurdî bi yek be, û çawa wê bigihê serî?

Belê.. pir pirs tî hene, wê çawa dem ji alîkî, û gelê Kurd ji alêkî din vê birsivê bi xurtî bide. Çi divê ji Kurdan re bikin ta bigihên hêvî û armancan, û ta çi radeyê ev çewtî wê berdewam bike? An ta bi kengî wê di vê aravê de xwe bişon? Pir çima û ta kengî û çawa hene li holê, lê nizanim bersiv û derman çi ye..? Yan xuyaye li asoyên nêzîk tu çira xêrê ku destpê kiriye nuha tuneye..!!

Weke mînak, azmûneya rojnameya (Nûdem) bi serî nebû, lê bi hêvî ne riya rojnameya (Bûyerpress) bersivê bide.. bi teybet rojnamak serbixwe be, û beşên nûçan werin şopandin.

Her wiha jî vê demê bûyerin mezin çêdibin, gelo Rojnemegeriya me kare pê re melevaniyê bike, bûyaran weke çêdibe bêje, bê ku xwe bike aliyek, an bûyer weke bûye.. û nûçeyan bi zelalî bişopîne.

Em dizanin gasîna me ya civakî bi çi rengî lihev hatiye, belê, ev nexem e, çimkî civata cîhanê tev de wiha ye, lê ya giring ew e bi yek namê be, bi yek nêrînê be, ta cemawer tevaya cemawer têkeve wêna bûyer û nûçeyan.

# Vê gotarê bixwîn


Ibrahîm Xelîl

Berî her tiştî, ez xweş dizanim ku ji her deh kesên çav li vê gotarê kevin, ê du kes ji wan dest bi xwendina wê bikin û yek tenê ji wan ê benê êşê bikişîne ta dawî û vê gotarê temam bike, ne ji ber tiştekî, lê hew ji ber ku ev gotar bi zimanê kurdî û bi tîpên latînî hatiye nivîsandin ... sed mixabin.

Kurd li ser çar welat û sê zimanan belav bûne, û ew bi zimanên wan welatan xwendin û nivîsandina xwe dikin, lewra kurdê her deverekê dixwaze ku çi gotar be bi zimanê fermî yê wê dewletê be, kurdê Sûrya dixwaze ku ev gotar bi erebî be, û yê Turkya dixwaze bi turkî be, û yê Îranê dixwaze bi farisî be... û herweha, lê çima zimanê biyanî bi kurdan ji yê wan şêrîntire? çima zimanê dê li cem kurdan bûye zimanê duyem? Bi sadeyî, ji bo parastina demê û rehetiya çavan, ji ber ku xwendina zimanê biyanî bi wan siviktire ji yê kurdî, û ev kes bi xwe, ku gotin li gotinê dikeve, dibêjin : "Em kurdin û serfirazin bi kurdîtiya xwe !!".

"Xweş xebere..." wek ku pêşiyan gotiye, lê yê kurd dilê wî bi ser zimanê wî ve ye, ew dizane ku zimanê wî kême - heger kêm be - ji ber texsîriya wî, ne ji ber ku xwedê ew wisa çêkiriye, û yê kurd ji ber zimanê xwe fedî nake û xwe bi zimanê xelkê pozbilind û paye nake.

Du kes ji zimanê kurdî acizin û di dilê xwe de dixwazin ku xwedê wan jê xelas bike, lê xwedê navê, ew kes evin :

- Hin şovîniyên ereb û farisî û turkan : ku bi çavê siyasetê ne bi yê zanistiyê li zimanê kurdî dinerin, û ji ber ku ew her dixwazin ku kurd bimînin kole ji wan re, ew zimanê kurdî kêm û pîs û qedexe dikin.

- Hin rewşenbîrên kurdan ku li ser zimanê biyanî ( turkî, erebî, farisî ) rabûne û pê xwendine û nanê xwe pê dixwin, ev kes bûne zarokên rewşenbîriya biyanî û zimanê kurdî li wan bûye bela.

Bê guman, tevaya zimanên cîhanê cihê rêzgirtinêne, û zimanek ji yê din çêtir tune - Ziman stêrkin wek ku Hemzatov dibêje -, û zimanê erebî - wek mînak - ku hîn yê çaxa pêxembere, û ew pirr cudaye ji erebiya îro ya di nav devên xelkê de, em dibînin ku tev wilo jî ew ji nik milyonên kesan bi rengekî rojane tê xwendin û nivîsandin.

Zimanên turkî û farisî ku nîvê ferhengên wan erebîne, bi milyonên kesan pê di axivin û dinivîsin û dixwînin, û ev her sê milet qedrê zimanê netewî xweş dizanin lewra ew her sal bi milyonên dolaran xerc dikin di ber parastin û belavkirina zimanên xwe de.

Pêşketina çi zimanî bi pêşketina xwediyê wî ve girêdayî ye, va zimanê ingilîzî îro serwerê zimanaye ji ber ku du dewletên gewre ( Amerîka û Brîtanya ) pê di axivin, û va, li hember, sê hezar zimanên din kesî bi navên wan nebihîstiye ji ber ku xwediyên wan zimanan li deştên Mongolya û dehlên Amazon û li hawîrdora çemên Hind û Çînê ne.

Çi zimanê ku dereng dest bi wêjeya xwe bike - mîna kurdî - ewê di hin kêmaniyan de wer be wek :

- **Xwendevan kêmin** : ji ber ku yê xwendevan ji xwendina xwe li sûdê digere di kurttirîn dem de, û ji ber ku ta nuha çi zanyariya bi zimanê kurdî tê nivîsandin ew pêşî di zimanên biyanî de hatiye ( ku wan jî ji ber ingilîzî girtiye ), û wisa jî medya kurdî peyrewa ya biyanî ye. Tîpên erebî ( islamî ) bêtir nêzîkî çavên kurdên Iraq û îran û Sûryayê ne lewra em dibînin, em bêjin nebêjin, ku tîpên latînî ( AB ya mîr Celadet ) baş girane bi xwendevanên kurd li van her sê welatan. Û tevaya kurdan - ji pêvî yên Turkya – ne hogirî tîpên latînîne lê ev pirsgirêk çareser dibe bi pêşketina fêrkirina zimanê kurdî û belavkirina wî bi awayekî rêbazkirî û bê hedan.

- **Şêwazên kesane li cem nivîskaran tune ne** : pirraniya nivîskarên kurd bi yek şêwazî dinivîsin çi helbestvan, çi çîroknivîs, çi rojnamegêr ji ber nebûn yan kêmaniya pêşewa û rêberan lê xem nake, kurdî îro bi çarpêka dimeşe, sibe ewê rabe li ser pê û dusibe ewê bazde...

- **Xwendevan nezanin bi gotinên ferhengî** : Gelek gotinên biyanî ketine nav zimanê kurdî de ( zimanê gelêrî ), û dema nivîskarê kurd dinivîse ta ku jê tê ew xwe ji gotinên biyanî dûr dixe û li şûnê gotinên kurdî ji ferhengan derdixe û bi kartîne, lewra alozî peyda dibe di navbera nivîskar û xwendevan de. Li vir, medya kurdî ( TV, radio, rojname, internet) dikare bi vî barî rabe û gotinên ferhengî vejîne.

- **Hander (Hafiz) tune ji bo fêrbûn û bikaranîna zimanê kurdî** : Nemaze handerê aborî ku jiyana mirovan li ser ava dibe. Ev alozî çareser nabe ku giyanê dewletekê yan xweseriyekê li dar nekeve, wê gavê ne hew yê kurd lê gelek biyanî ê berê xwe bidin fêrbûn û xwendina kurdî ( wek çawa nuha li başûrê Kurdistanê). Lê ji nuha û ta ku ew dewlet rabe gerek handerê me tenê welatperwerî be.

Em di sala 2014 an de ne, û di seranserî cîhanê de miletek - ji pêvî kurdan - nemaye ku jimara wî bi ser 40 milyonî ketiye û hîn, mixabin, bê dewlet û destelate...

Ey nivîskarê kurd, ey xwendevanê kurd, ey rewşenbîrê kurd :

Jiyan û hebûna çi miletî bi zimanê wî ye, û ku zimanê kurdî nemîne - xwedê neke – kurd bê guman namînin.

Zimanê te ne kêmî tu zimanên dunyayê ye, ne bi gotinan û ne bi rêziman û ne bi karîna mayîn û pêşketinê

Ey nivîskar û xwendevan û rewşenbîrê kurd :

Miletê qels tenê wek jina bî rûdinê û li xwe dixe û li ser bextê xwe yî reş digirî, û di her boneyê de parsekiya siyasî dike û dilê meriv û cîranan bi xwe dişewitîne ka belkî ew xêrekê pê bikin ... lê kurd ne qelsin

Miletê nezan tenê nasnake ku taybetmendiya wîyî miletî zimanê wî, û ji ber zimanê xwe fedî dike ... lê kurd ne nezanin

Û madem kurd ne qels û ne nezanin ka çima di vê rewşa xerab de ne ta roja îro ? çima em dikarin bi erebî û turkî û farisî behsa kurdan bikin û bi kurdî nikarin? çima gihakê hewşa me bi me tehle, û saza bilûrvanê me me nehejîne ? Ez van pirsan dikim,

Û dawa gotina xwe li serê wê vedigerînim :

*Vê gotarê bixwîn*

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpress@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer
Nûçe Bi ... Zelalî

# Bixwînin Sîrwan H. Berko Çi Gotiye :

Hevpeyvîn : Qadir Egîd



- ARTA FM ne radyoyeke Kurdan e...
- Rêvebiriya Xweser ji karê xwe ne razî ye. Û nikare xwe bi zorê bide qebûlkirin.
- Min vîdyoyên Serhildana Qamişlo 2004an nefirotine ti kesî. Tenê ...?!
- Ciwan Ferso mirovek ne rast bû, dadgeh bû û hate cezakirin.
- Xebata ragihandina Kurdî di bûyerên Şingalê de nuqteyeke reş e.
- Ger siyasî û leşker destên xwe nexin nav karê me de, wê rewşa me baş be.
- Silêmaniyê paytexta rewşenbîriyê ye, li Hewlêrê çanda eşîrtiyê serdest e.
- Ta niha dora Sêsed û Pêncî hezar Dollar li ARTA hatine xerckirin.



**- Di destpêkê de kurtejiyana Sîrwan H. Berko.**
Ez 37-salî me. Di 13-saliya xwe ligel malbata xwe koçberî Elmanyayê bûm. Zewicî me û kurek min heye.

**- We kengî dest bi karê rojnamegeriyê kir?**
Min di sala 2000î de Malpera Amûdê damezirand. Hingî ez 23-salî bûm. Amûdê yekemîn malpera kurdî bû ji bo Kurdên li Sûriyê. Di sala 2005an de min di radyoya Elmanî ya fermî WDR de dest bi xebata radyoyê kir. Hingî xebata min ji bo "Bernameya Kurdî" bû. Pişt re min ji bo bernameyên Elmanî û gelek rojname û kovarên elmanî kar kir. Herweha min ji bo çend dezgehên ragihandinê li Herêma Kurdistanê kar kir. Min herweha wek rahênerê radyoyê kar kir û li Herêma Kurdistanê, Urdun, Tirkî û Sûriyê bêtirî 150 rojnamevan perwerde kirine.

**- Tê nasîn ku tu yek ji wan kesên damzirênerên yekem ji dezgeha ragihandê ji bo Rojavayê Kurdistanê bû, ew kar çawe destpê kir, û hûn û kî bûn?**
Ramana damezirandina radyoyekê di adara 2013an de bi min re çêbû. Radyoya ARTA FM di 6.7.2013an de li Amûdê dest bi weşanê kir. Ev yekemîn radyo ye li Sûriyê û Rojhilata Navîn ku bi Kurdî, Erebî û Suryanî bernameyan pêşkêş dike. Ji destpêkê ta niha ez serpiriştiya vî karî dikim. ARTA FM projeyeke rêxistina ARTA ji bo Ragihandin û Piştivaniyê ye. Ev rêxistin di nîsana 2013an de li Swêdê hatiye damezirandin û bi awayekî fermî qeyd kirin.

**- We çawa serhildana Qamişlo di 2004an de şopand?**
Min bûyerên li Qamişlo û bajarên din di Avdara 2004an de deqe bi deqe dişopandin. Hingî Malpera Amûdê roleke bingehîn di belavkirina nûçe û dîmenên wan bûyeran de lîst. Di rêya vê malperê re me karî bala raya giştî ya cîhanî bikişînin ser bûyerên li welêt.

**- Dibêjin ku Sîrwan H.Berko parçeyên vîdiyoyî yê serhildanê firotin kenala Alcezîrê û BBC?**
Ev gotin ne rast in. Bi alîkariya hin hevalên li Swêd, Nerwic û Brîtanyayê me karî dîmenên ji Qamişlo di televizyonên wan welatan de biweşînin. Min ti vîdyo nefirotine ti kesî. Ev derew e. Tenê kanala ingilîzî "Channel 4" ji bo weşandina du vîdyoyan hinek pere şandin. Ew jî ji ber ku ew kanal berheman bê beramber naweşîne. Beşek ji wan pereyan giha xwediyê vîdyoyan li Qamişlo. Beşek din hingî li ser mesrefa Malpera Amûdê hat xerckirin. Li ser vê babetê min di 10.12.2004an de di Malpera Amûdê nivîsek weşand. Mirov dikare wê nivîsarê li vê derê bixwîne: http://goo.gl/0mHkxb. Şahidên van bûyeran hîn sax in.

**- Dema Şoreş li Sûriyê pêket, we çi amdeyî ji derve jê re kir?**
Ji ber ezmûna min di warê ragihandinê de min di vî warî de hin gav avêtin. Min ji pêşî de biryar stend ku ez tevlî siyaset û çalakiyên siyasî nebim. Ez rojnamevan im û dikarim di vî warî de bêtir alîkariyê bikim. Peywendiyên min ên berfireh bi alavên ragihandinê yên Elmanî hene. Min agahî didan rojnamevanan û gelek hevpeyvîn dan. Herweha min di malperekê de kar dikir, ku bi çar zimanan agahiyan li ser binpêkirinên mafên mirovan li dijî Kurdên li Sûriyê diweşîne.

**- Pirojeya vekirina Radiyoya ARTA çawa di serê we de meya, kê alîkariya we dike, Xoşnav Têlo cihê wî tê de çi ye?**
Tim xewna min bû ku li bajarê xwe Amûdê radyoyekê vekim. Bi destpêka şoreşa li Sûriyê min rola xwe bêtir di karê ragihandinê de dît. Dema firset çêbû, min yekser dest bi avakirina vê radyoyê kir. Dezgeheke Emerîkî û herweha dezgeheke Swêdî ji pêşî de alîkariya me dikin. Ta roja îroj alîkarî berdewam e. Me li Amûdê dest pê kir. Niha li Dêrikê, Qamişlo, Serê Kaniyê û Kobanî jî nivîsgehên me hene. Em weşana xwe li wan bajaran dikin. Ji bîst karmendan di destpêkê de niha dor heyştê karmendên ARTA FM çêbûne. Xweşnav Têlo serokê rêxistina ARTA ji bo Ragihandin û Piştivaniyê ye. Ew, Umer Şêxmûs û ez birêvebiriya vê dezgehê dikin. Endamên me li gelek welatên cîhanê hene.

**- Çiqas pere ta niha li ARTAFM çûne?**
Ev çardeh meh in ku ARTA FM weşanê dike. Ji destpêkê heta niha dora sêsed û pêncî hezar Dollar hatine xerckirin.

**- Çima rojnamevan Ciwan Ferso ji ARTAFM derket û şerê we kir..?**
Em heta îroj nizanin çima wî şerê me kir. Ew mirovek ne rast bû, ne bi xwe re, ne bi dostên xwe re, ne bi me re. Wî ji bilî derewan tiştek negot. Me li cem Dadgeha Gel li Amûdê li wî gilî kir. Wî nekarî idîayên xwe isbat bike. Û ne yekê ji wan! Ji ber vê yekê dadgehê ew ceza kir. Ji bo me giring e ku her kes nikaribe derew û bêbextiyan di internêtê de belav bike, bêyî ku bê cezakirin. Baweriya me bi qanûn û dadgehan heye. Dadgehê gotina xwe got. Ji me re mesele bi dawî hat.

**- Gelek guhdarên we dibêjin ku zimanê Kurdî di ARTAFM de, qels û lawaz e, gello pispor di nav we de tune ne?**
Em tucarî îdîa nakin ku hertiştê em di ARTA FM de dikin, rast û paqij e. Em hewil didin karê baş pêşkêş bikin. Kesên ku di ARTA FM de kar dikin, berî niha ev kar nekiribûn. Piraniya wan di karê xwe de fêrî xwendin û nivîsandina kurdî bûn. Ji me re ne giring e ku ji destpêkê de her tişt wek zêr bibriqîne. Ji me re giring e ku keç û xortên devera me fêrî kar bibin. Roj bi roj pêşketin heye. Em niha bingeha ji bo sibe datînin. Bêyî şaşitiyan mirov fêr nabe. ARTA FM dibistaneke ji bo fêrbûnê ye.

**-Te li Kurdistanê carekê gotiye, Hewlêr cihê beg û axatiyê ye, Silêmaniyê cihê rewşenbîriyê ye, çima?**
Nayê bîra min kengî min ev gotiye. Lê her kes dizane ku Silêmaniyê paytexta rewşenbîriyê ye li Herêma Kurdistanê. Li Hewlêrê çanda eşîrtiyê serdest e. Ez nabêjim ku ev baş e yan xerab e. Lê ev rastî ye.

**- Hûn çawa rojnamegeriya Kurdistanî dinerxînin, nexasim di bûyera Şengalê de.**
Xebata ragihandinê ya Kurdî di bûyerên Şingalê de nuqteyeke reş a mezin bû di dîroka rojnamevaniya Kurdî de. Min di ti alavên ragihandinê yên kurdî de nedît ku rêz li welatiyên Şingalê tê girtin. Goriyên Şingalê û hemû Kurd bûn qurbanên propaganda ya dezgehên ragihandinê yên partiyan. Alavên ragihandinê yên kurdistanî şerê birakujiyê li Herêma Kurdistanê anî bîra min. Şermeke mezin bû!
Bûyerên Şingalê dubare isbat kir ku pêwîstiya Kurdan bi alavên ragihandinê yê serbixwe hene. Lê diyar e zû bi zû em ê nikaribin vê hêviyê bi cî bînin.

**- ARTA Kobanê, çi pirsgirêke ku nahêlin vebe?**
Xwezî me zanîba. Karê me ji roja pêşî de fermî ye. Me li kantona Cezîrê û li kantona Kobanê ruxsetên kar stendine. Yekîtiya Ragihandina Azad rawestandina ARTA FM li Kobanê şermezar kir. W'e got ku rawestandina weşana Arta FM li Kobanê xizmeta demokrasiyê nake û li dijî azadiya rojnamevaniyê û azadiya raderbirînê ye.

**- Tê gotin ku Sîrwan H. Berko di karê xwe de dektator e(Arta Sîrwan H. Berko ye, û Sîrwan H. Berko Arta ye) rast e?**
Bersiva min ev e: Ev 14 meh in ku ARTA karê xwe didomîne. Ji nivîsgehekê li Amûdê niha pênc nivîsgeh hene. Ji bîst karmendan niha 80 kes di ARTA FM de kar dikin. Serkeftin bê karê berdewam, westandina bê sînor û iltîzamê nabe. Ev 14 meh in em kar dikin û ta roja îroj pirsgirêkeke mezin ji karê me derneketiye. Li deverekê ku her roj hin kes hene keviran davêjin kesên serketî û dixwazin wan bixin. Li deverekê ku karê ragihandinê yê pîşeyî nas nekiriye. Eger ev dîkatoriyet be. Ser seran û ser çavan.

**- Gelek malper li ser gendeliya di ARTAFM de axivîn, tu çi dibêjî?**
Kî çi dixwaze bêje, bila bêje. Baweriya me bi azadiya derbirînê mezin e. Lê kesên ku li malên xwe rûniştine, û hema derewan belav dikin, bê isbat, mirov nikare bersiva wan bide. Dadgeh hene, yek li wir dikare mafê xwe bistîne. Kesê ku ev derew belav kirin, nekarî isbatekê li ser derewên xwe pêşkêş bike. Dadgeha Gel li Amûdê ew derewçîn derxist û ew ceza kir.

**- Sîrwan Berko çi piroje ji bo Amûdê amade kirine?**
Amûdê bajarê min e. Ez jê hez dikim. Ez dixwazim Amûdê li ser asta Sûriyê bibe bajarek nimûneyî. Bajarek ku her welatiyek wê çalak e, guh dide xwe û bajarê xwe. ARTA FM û dezgeha ARTA gelek proje li Amûdê pêk anîne. Di warê sport, mûzîk û hunerê de komek projeyên me ji bo zarok û jinan hene. Lê ne tenê li Amûdê: ji Dêrikê bigir heta Serê Kaniyê, ji Kobanî heta Efrînê, em dixwazin li hemû bajaran karê xwe bidomînin û projeyan pêk bînin. Em beşek in ji gelek hewildanên ku xelkên deverê ji bo gund û bajarên xwe dikin.

**- Ji pêvî te û Xoşnav Têlo Berpirsên veşartî ji Arta re hene?**
Tiştekî me yê veşartî tune. Ne di ARTA FM de û ne jî di dezgeha ARTA de. Baweriya me bi karê veşartî nayê. Ez berpirsê ARTA FM im. Xweşnav, Umer Şêxmûs û ez birêvebiriya dezgeha ARTA ji bo Ragihandin û Piştivaniyê dikin. Endamên me li gelek welatên cîhanê hene.

**- Çend sazî û dezgeh bi ARTA ve girêdayî hene?**
Ti sazî tune ne.

**- Çima ARTA li Amûdê vebû û ne li Qamişlo?**
Ji ber Amûdê tek dever e ku mirov dikare lê karekî bi vî awayî dest pê bike. Amûdê xwedî taybetmendiyeke cuda ye. Mirov nikare bêje bê ev taybmetmendî çi ye. Divê mirov li Amûdê bijî, da ku mirov fêm bike bê Amûdê çima ewqas giring e.

**- Çi çîroka ku ARTA gelek weşanên radyoyên Islamî, û ên hemahengiya Sûrî bi dizî diweşand..û çend rojan jî ji bo wilo hat rawestandin?**
ARTA FM tucarî tiştek bi dizî nekiriye û nake. Yan em ê karê xwe eşkere bikin, an em nakin. Di avahiya ARTA FM de radyoyeke din bi navê MICT dihat weşandin. Ev radyo Elmanî ye. Yekîtiya Ragihandina Azad ruxseta wê dabû. Karê wê radyoyê qanûnî bû. Heta îroj me fêm nekir çima weşana ARTA FM sê rojan hat rawestandin.

**- Çi projeyê Sîrwan H. Berko ên ragihandinî hene?**
**ARTA FM. Serê min ji bo tiştekî din ne vala ye.**

**-Tu çima ji karê Rûdaw tv nerazî ye?**
Ez ji karê Rûdaw ne nerazî me. Mîna li ser gelek alavên ragihandinê, ez carinan têbiniyê xwe li ser Rûdawê jî dinivîsim. Hêviya min ew e ku ragihandina kurdî xurt bibe.

**-Di nerîna Sîrwan de kîjan dezgeh ragihandinê dike, û bêlayen û azad e ,kurdî bi giştî?**
Lê digerim, lê nabînim. Guhdarên ARTA FM dizanin ku ew her tiştî dike ta ku nebe alîgirya ti alî.

**- Çend karmendên Arta Fm dev ji kar berdan, ji ber ku peymana di navbera we de bi rengekî bû û mûçeyê wan ji wilo kêmtir bû, çiqas ev gotin rast e.**
Sifir karmend. Hemû peyman û belgeyên wergirtina ratiban li cem hene. Ta niha ti kesî belgeyek ji bo vê derewê belav nekiriye.

**- Di hevpeyvîneke xwe de bi rojnmaeya Teaxî re te got ragihandinek azad li Kurdistan tune ye, tenê hin pirojeyên wêrek in, gello li Rojava jî wilo ye?**
Ma li Rojava ragihandin heye? Em hîn di destpêkê de ne. Lê ez bawer im ku ger imkanên baş peyda bibin, em ê bikaribin karekî baştir bikin.

**- Sîrwan ji karê Rêveberiya Xweser razî ye?**
Ez bawer im Rêvebiriya Xweser bi xwe ji karê xwe ne razî ye. Ezmûneke nû ye. Azadiyên giştî û xizmeta welatiyan pîvanên serketin an têkçûna wê ye. Rêveberiya Xweser nikare xwe bi zorê bide qebûlkirin. Divê peyv tim a welatiyan be.

**- Tu dibînî ku saziya Yekîtiya Ragihandina Azad ya di bin siya Rêveberiya Xweserî de kar dike azad e, bi kêrî berevaniyê di ber rojnamevanan de bike tê?**
Ta niha me wek ARTA FM ji bilî alîkarî û piştgirtiyê tiştek ji Yekîtiya Ragihandina Azad nedîtiye. Divê partiyên siyasî û hêzên Asayîş û leşkeran dûrî karê ragihandinê bikevin. Bi vekirina deriyên xwe ji bo nerînên rengereng YRA dikare bibe dezgeheke ji bo piştgirtiya rojnamevanan li devera me. Lê mixabin nimûneya ARTA FM li Kobanê diyar dike ku Rêvebiriya Xweser rêzê li YRA û karê wê nagire. Divê ev yek neyê qebûlkirin.

**- Tu çend sala dûrî Amûdê ket? Çima tu li Amûdê najî?**
Ez di sala 1990î de ji Amûdê derketim. Piştî 23 salan, ango di sala 2013an de, ez cara pêşî vegeriyam Amûdê. Ji hingî ve ez berdewam vedigerim Amûdê. Armanca min ew e ku ez jiyana xwe ya mayî li Amûdê bidomînim. Ez li ser vê yekê kar dikim.

**- Di salvegara damezirandina Arta Fm de, armeyek filêks bi sê zimana hebû, pêşî Erebî û Siryanî bû, û dawî bi kurdî bû, gello ev bi çi wateyê tê?**
Ti ferq di navbera pêkahtiyên devera me û zimanên wan de tune ye. ARTA FM ne radyoyeke Kurdan e, ew radyoya xelkên deverê ye: Kurd, Ereb, Siryan, Aşûrî, Ermenî, Musilman, Krîstiyan, Êzdî û yên din. Ji me re ne giring e kîjan ziman gerek li pêşî be. Lê ev yek sudfe bû ku erebî li jor bû. Ne pirsgirêk e.

**- Gotinek dawî ji bo ragihandina Rojava, hindek şîret.**
Dema her kes karê xwe bike, em ê bi ser kevin. Siyasî siyasetê dikin, polîs û leşker parastinê dikin û rojnamevan karê ragihandinê dikin. Ku siyasî û leşker destên xwe nexin nav karê rojnamevanan, wê rewşa me gelekî baş be. Divê her yek ji me rêzê li karê yê din bike. Tenê bi rastiyê bawerî çêdibe. Rojnamevanê ku ji agahiyekê ne piştrast be, yan belge di nav destên wî de nebin, nabe wê agahiyê biweşîne. Berî hertiştî exlaq.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpress@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer press
Nûçe Bi ... Zelalî

# Dawiya Piyalê

Hekim Ehmed

## Hêviya Nuh

***Jiyîn çiqas delal e**
**Di nêv bav û biran da**
**Dil heye ko nenale**
**Ber birînên riman de**
**Ev birîna riman e**
**Barekî pir giran e**
**Kezeb gurçik nemane**
**Li pepûkên xwehan da**

** Ji pirtûka (Qedrî Can). Komkirin û amadekirin: Dilawerê Zengî. R.107.*

**Jiyîn çiqas delal e:** Gava mirov vê hevokê dixwîne, bawer dike ku xwediyê wê di kêfxweşiyeke bêhempa de dijî, ji xwe ku em nas bikin ku bêjerê wê xudan gel û welat e, em ê bêjin ku helbet welatê wî azad e, gelê wî serdest e, hevokeke navane bi du gotinan (jiyîn→delal e) û di navbera wan de (çiqas) wê delaliyê bêhtir dike, belkî mirov matmayî bimîne û bikaribe bipirse: Gelo Kurdan ev di dîroka xwe ?de gotiye

**Di nêv bav û biran da:** Li vir, me nas kir ku mercek ji bo delaliya jînê heye, ew jî ku di nêv bav û biran de be, kesên ku pişt bi wan tê girêdan, lê gelo ev pesindana rewşê ye, lavijek ji bo sibe ye yan jî hesret û ?bêrîkirin e

**Dil heye ko nenale:** Dixwaze tekez bike ku li nik bav û bira carina mirov dilxweş dibe û bê nalîn dijî, ji ber tu pirsnîşank nehatiye danîn ku em bêjin mebesta wî pirs û hesret e. Lê dîsan jî em dibêjin ev nûjeniyek di wateyan de ye tevî ku Qedrî Can naskirî ye ku helbestevanê yekem bû ku nûjenî di şêwe û terazûya helbesta Kurdî de bi kar aniye, lê nûjenî di raman û wateyan jî di helbestên wî de diyar e, .helbet li gor dema wî

**Ber birînên riman de:** Ev xêz têvel e, êşeke mezin tê de heye, piştî ewqas geşbîniya bûrî, piştî bendewariya me, ji nişka ve, dil dikeve bin riman de. Tiştê balkêş ku êşê bêhtir dike (dil) yekjimar e, (riman) gelekjimar e, ji ber wê (birînên) jî gelekjimar e, ya din peyva (rim) birîn kûr û giran kiriye ji ber ku di nav çekên kevin (xencer, şûr û tîr) de rim a herî giran e.

Ev birîna riman e: Careke dî tekez dike, weke ku bêje ji xewa şîrîn rabe, (ev.. e) rastî li pêş çavên te ye, lêkera bûnê jî di dema niho de hatiye ji bo rewşê berçav bike.

Barekî pir giran e: Tim Qedrî Can wateya xwe di rewşa dijwariyê de diyar dike, weke piraniya helbestevanên klasîk hevwateyan jî pir nake, lê ji dêl wê ve peyvên bi hev re heval yan cot tîne, ango yên wateyên wan nêzî hev bin (çiqas delal e), (bav û bira), (birînên riman) û (barekî pir giran), di vê hevoka dawî de, (bar) bi tenê dikare wateyê bide ango derbirîna rewşê dide, lê ji bo wateya wê bêhtir dijwar bibe, helbestevan (giran) û (pir) pê re anîne.

Kezeb, gurçik nemane: Di helbest û mecazê de kezeb yan gurçik bi xwe ji aliyê hestdanê ve wêneyeke dil e, lê ji dil bêhtir dilşewateke bi tirs û hesret dide, ji xwe gava ku tu bibêji (nemane), tê wateya ku şewitîne û êşiyane. Ev hevok tevî mecaza xwe hêsan e, ji ber wê rahiştiye wateya bikaranîna gelêrî ango ew li ser bingeha wateyeke berê naskirî di çanda zimanê rojane yê civakê de ava bûye.

Li pepûkên xwehan da: Xwihên pepûk, hejar û xemgîn. Yawo Qedrî Can, bi xwedê jiyan delal bû, qey çi bû? Ya din xwih û berî niha bav û bira, lê bise, kanî dê?

Herdu hevokên dawî di (Ferhenga Kurdî Nûjen) ya Elî Seydo Goranî de hatine ji bo şirovekirina wateya (pepûk), lê jêder û navê helbestevan nehatiye nîşankirin.

## Adar Kenî

**Bavê Biyan**

Sozek ji wan lêvên te xwend
Dil û ceger hatin sema
Meydan vebû, mil mil hejand
Derbûn ji dil pêlên xema

Adar kenî, gul bişkivîn
Newroz e, her sal ev dem e
Şalûl û bilbil xweş civîn
Jiyan di nav lêvên te ma

## Welatê Min



**Melevan Resûl**

Welatê min , welatê min
Xwîn û rahî di dilê min

Ava te mîna kewsere
Şêrîn , şerbet û şekire
Dinya hemî heger bax bin
Lê pa ji wan tu çêtir e

Xwedê zanê çiqas canî
Siruşt , dîmen , çem û kanî
Li ber çavan tu bînahî
Sira Xanî û Nîşanî

Îro li ser ceng û şere
Top û legan û leşkere
Qet, qet ji hev parî kirin
Navê xwe danîn e ser e

Agir , şewat lê gur dibe
Pêt û rimî jê ra dibe
Hin jê dibên: şer lê niye
Malik di mîratê dibe

Xwîna zelal va tê rijîn
Dîrok ji nûve tê vejîn
Axa temîz azad dibe
Sed tif li rûyê derewîn

Ger ku ji min bawer nekin
Mihrava cangoran fekin
Ba-os li ber çav şahide
Rêza goran, kur û keçikin

Şîn û girî û lorîne
Pisk û ceger şewitî ne
Deng çû giha Hind û çîne
Kurdê newêr veşartî ne

Nirxê welat mêraniye
Destê di hev piş girtiye
Xwîna zelal, pakê rewan
Mizgîn ji mer wan aniye


## Were Hevalê Min



**Çîmen Adi Elî**

Were hevalê min
were ba min
Xerîbî bi hevaltiyê hinekî
hesan dibe..
 Were em bistrênin
Sitran hundirê mirov hedar
dike…
Bendewariyê dikuje….
Were…
diya min hinek kuliçe bo min
şandiye
 Were em bîranînan vegerînin..
Û keserên westiyayî ji sînga
xwe derînin..
Me zanî welat çi ye
Û me xweş zanî penaberî çi
ye…
Lêêêê zarokên me wê çi zanibin?
 Tenê bîranînên t`al….
Û sawirên seqet wê di hişên
wan de bihejin
Wê bimînin biyanî wê
bimînin mêhvan.

## Min Şop Ajot..



**Dilawerê Zengî**

Li welatê rojê
Li delava Derya Sipî
Li welatekî kuştî
Li çiyayê gurandî
Li deşt û nehêlên darvekirî
Li ser hilma xwîna kizirî
Min şopa xewna xwe
ajot…

Li Rojhilat
Heyva çarde me..
Rêvingên riya birîndar
Ez û pênivîs û qetek nan.
Di dilê şevê de
Di cegera asîman de
Di rêkên herifandî de
Bi gavên xweyî razayî
Li ber dîwarekî bê guh
Min pênivîsa xwe şiyar kir.
Kerwanek ji stêran
Neynika xewnên min
şikandin.
Çûkên ramanên min firandin.
Di çavê şeva kor de
Bi xewnên pêçayî,
Dilbijandina pênivîsê
Talan kirim..
Wêran kirim..
Lê, min şop ajot…

Ez û pênivîsa xwe
Bi refên kul û derdan
Bi xiştexişta pênivîsê û
kirtekirta nanê tisî
Bi gavên birîndar
Bi zimanekî bê giyan
Ji salên bê demsal
Darbesta demên beravêtî
Li milên miriyan bar kirin..û
Min şop ajot…

Şev û roj li me bûn hêlan..
Di quncikên kit kita çerxê
Movikên demê digurînin..
Li deşta Mêrdînê
Li ber dêmên gula berberoj
Pencên rojê yên qemirî
Li ber sîka bê ken
Agirê sar û westiyayî
Çemên dîl û giriftar
Li deşta leylan û awêze
Bi pêlava xewnên pênivîsa
xwe
Min şop ajot…

Homanên xêrnexwaz
Di qoqê kewênêr de
Hêlînek belav kirin.
Di gerîneka çavan de
Şopa xwînê gerandin.
Li ber seqema hewesa min
fenera dilê xwe vêxistin.
Li ber pencera demên min
Bêndera demên xwe
gêrandin.
Li ser baskên xewnên min
Hêviyên xwe veçirandin.
Li ber deşta ramanên min
Dehl û zeviyên xwe
şînkirin.
Li ber germbûna devê
birînên min
Termên hêsrên xwe ziwa
kirin.
Li ber saza ahînên xwîna
min
Peyala meyê gerandin.
Û li ber çingîna peyalan
Min şop ajot…

Di gerînoka mişextiyê
Di şevînên qetiyayî
Di awêza awareyî
Li çiyayê gerdenazad
Ji girêbend û lalên zingerbûyî
Kewênêr bi azatî azad
bûn… .
Bi qebqebeke nû..
Bi dilekî aza..
Bilûra xwe saz kirin..
Û bi xwe re..
Mizgîniya maçîkirina
heyvê anîn..

## Axavtinek li Gel Canê Melayê Cizîrî



**Xalid Umer**

Mesaul xeyrî xanê min
Tuwî rûh û rewa canî
Vebestij, pertewa tûrê
Ji lew mayî tu nûranî

Dema şewqa te îsabû
Suheyl girya li kîwanî
Rehêlî tul, seqa ristan
Mij û mo rin tu baran î

Ji ristên te dibarînin
Dilopên şîr û şêranî
Ji lew îro meges teb´im
Li ser şaxê te min danî


Mesaul xeyrî xanê min
Li ser şaxê te dildar im
Bi tîrên çeşmeyên mexmûr
Ji nîva dil birîndar
im

Di mihra tey nepen dilber
Lepên bêrya te ez
xwarim
Seraser ez hevotim lew
Hezar perçew, hezar par
im
Ji sînê dil firî îro
Li ezmanê te reftar im

Mesaul xeyrî xanê min
Dilê min sed keser tê da
Dirêsim deftera işqê
Ji qabê ber bi qabê da

Hewil danên gihiştna yar
Hemî winbûn di ber bêda
Ku bageştên mi tên xwarê
Di hev wertêm di avê da
Mesaul xeyrî xanê min
Dilê min sed keser tê da


## "Şingal im.."



**Xunav Kano**

Şingal im…
Çiya û lat im…
Karwana qurbaniyê me..
Misilmanên xwîn mij min ji
xaka min talan kirin …
Û cilên min ên sipî bi rengê
aştî û şehristaniyê qetandin…
Çavê zariyên min giriyandin…
Bi şûreke genî û bêbext ez
revandim…
Şingal im…
Ahora û Avista û Zeredeşt u
Laleş im..
Goreke bêkes û li merqeda
xwe bi jar û xemgîniya xwe
her ez zindî me…
Bi berf û payebûna serê Sincara xwe her ez Kurd im…
Bi lingên pînekirî li biyabanên diniyê digerim
Belkî ez şopekê ji ciwanên
xwe yên serjêkirî bibînim…
Û bi lagireke bi dengên birîndar ser canê wan bistirêm…
Û bi guliyên xwe yên belawelakirî ber xwe didim…
Ji bo aveke ji welatê xwe yê
mîna porê min belawelekirî
ye vexwim..
Şingal im..
Li vir ez dikoşim…
Piskên xwe sor dikim…Û Ji
bo parastina we diyarî
dikim…
Niha Nêrgiz, Şilêr û Hîro…
Axa Reqa û Mûsilê rengîn
dikin…
Vaye şikeftên me yên kûr bi
ronahiya momên Êzîdiyê
pêşwaziya me dikin..
Vaye dîsa zarokên me ji
zarok û jiyanê bixwas
dimînin…
Şingal im…

## XEWN Û XEYAL



**Ehmed Mustefa**

Di xeyala de difirim
Li dunyayê digerim
Digerim li welatekî
Lê welatekî kuştî dibînim
Dibînim buharek xweş e
Di nav gulan de rûdinim
Dengê bilbila dibihîsim
Lê bayê bêhna gulan
dibêjim mizgîn e
***
Difirim li asimanê jor
Êstêrekan dijmêrim
Naxwezim şiyar bibim
Dixwazim xewnên xwe
pêk bînim...

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpress@gmail.com
WhatsApp 00905368908545

bûyer PRESS
Nûçe Bi ... Zelalî

# Qûnax û Bersiv



Zahid Mehmûd

Ji dema sê salan û vir de, piştî ko ev rewşa awarte di Sûriyayê de peyda bûye wekî ku li gelek welatên herêmê jî çêbûye, ya ku tête naskirin bi navê Buhara Erebî yan jî Buhara Gelan ya ku ji du hezar û çaran ve, li cem Kurdan destpê kiriye.

Xuya ye, vê şoreşê hin ji hêviyan û derfetan nêzî me Kurdan bi teybetî kiriye, ew jî dema welatê me Sûriyê bi giştî bête guhertin û ber bi dewletek mafnas ve here, wê ji gelê me re jî tiştekî baş be, dê rê li pêşiya daxwazên miletê me vebe, da mafê xwe pêk bîne, lê di heman demê de, wê ev derfet ne hesan û ji ber xwe ve bi cî bên, ji ber ku ev ger û tevger û rûdanên roj bi roj têne holê û guhertinên diramatîkî yên ku helwestan di navbera şev û rojê de ji hev cuda dikin, ne ji ber xwe ve tên.

Lê ya giring sebaret bi miletê me ew e ku em vê derfetê bidest bêxin li ser bingeha ku mafê netewî û nsanameya xwe wekî gel di belgeyên fermî de bi zagonan biçesipînin, bidin pejirandin bi kesên din re di Sûriya ayînde de, lewra pêwistî heye ku hemî Kurd bi rengên netewî baxivin û dûrî minminiyê bikevin û eydiyolociyên xwe deynin derê han, ji ber ku hebûn û mana gelê me li ser vê xakê girêdayî helwesta me û rastiya nerîn û pêşbîniyên me ye.

Lê mixabin li hember vê rewşê û vê derfeta zêrîn em dibînin ku tevlîheviyek di pergala siyasî de heye, dûrî ustûbariyê ye û divê em bêjin ku awirên me kin in, analîzên me ne wek hev in û caran dijî hev in û ji jîwariyê veqetandî ne.

Lewma hin ji me bi ser xwe de gelekî dikişînin û hin ji me bi dev kesên din ve berdidin û hin jî meyze dikin ka ev ger û tevger bi ku ve diçe û çi encamê dide, da di dawî de destên xwe bavêjin berhemê û ji xwe re hejmêrin bêyî ku tu karî bikin û hin din hewl didin cihê xwe çêbikin, xwe bikin hijmar di nav hijmaran de û hin din xwe diwestînin lê nizanin ka berê wan bi ku ve ye.

Birastî ev e, tişteke serê mirovan têşîne û sergêjekê li me digerîne, ev sosret e piştî vê ezmûneya ku bi dehên salan em tê re derbas bûne, tevlî hemî sitembarî û zor û zextên ku me dîtine.

lewra divê hemî Kurd û di serî de encumenên me, bersivê bidin li xwe vegerin û bi çavê biratiyê li hev meyze bikin, nêzî hev bibin

û li rewşa miletê xwe xwedî derkevin, ev miletê ko rastî penaberiyeke xerab hatiye, ta asta dîmografiya wî ber bi guhertinê ve diçe.

# BI PERÎSÊLKAN(1)NIKARIN TENÊ BI ME KARIN!!

Idrîs Hiso



Li başûrê Kurdistanê bi tevayî û li bajarê Berdereş bitaybetî zor zehmete gêncên bê jin (zugurd)(٢) karibin malekê kirêbikin,loma gelek astengî û arîşe tên pêşya wan, wek ku hat pêşya me heta me xanîk(şuqek) kirêkir ... ew mala me kirêjî kirye li rexê bajare û dûrî taxên wê ne .

Paşî van astengiyan û gelk pirsan em rastî xwedyê balexaneyekê hatin, çar şuqe tê de hene bo kirê .

Me yek neqand .. balexaneya ku xwediyê wê dide kirê bo gêncan(zugrdan) divê xêzantêde nebin, naxwazim xêzanên ji Başûr!!

Dema min ji xwedanê malê re got: "kaka lo(٣)tu xanî bikrê nade bo xêzanan"

Li min vegerand:"nabe berêz ...nabe kak Erame Eram(٤) "!!

Kurdên Rojava vê seyr dibînin , çinkî fêrî vê cudabûnê di civaka xwede nebûne, li aliyên din kurdên başûr jî seyr li me dinêrin, çinkî ew me kêm ol dibînin , naxwazim dema em li gel jinan têkilî dibin ....!!

Bi herhalî û bêyî ez serê we bikim bi êş ..

em ana di avahîkê dene xêzan têde nînin ..mîna gulîstanek bê gul ..wate ji navê wêre namîne …balexaneyek bê jin nema dimîne balexane,ev nizmexaneye ?!! Lê em çi bikin .. me tewkelî bi xweda re kir û em razîbûn … xweda jî em bê par ji dilovanya xwe nehiştin .. ew şarezaye û zane ne Erame (herame)

Perîsêlkekê hat û hêlîna xwe li rexme çêkir, û ew bû xêzana yekemîn ku cê xwe dibîne divê avahiyê de .. ana ew û sê zarokên xwe li gel me di avahiyê de dijîn û kirêjî nadin !. Em îro kêfxweşin, em nema bi tenê ne divê balexaneyê .... Emin û xezanek xwedî sê zaroke.

Tiştê baş ku xwedanê malê bi perîsêlkê nikare helbet wê ew derbikrana ….lê mala xweda avabe ew bi me tenê kare … û bi prîsipîkan nikre !!!

*1-hechecîk 2-li başûr jî xortê bê jin re dibêjin zugurd*
*3-çima 4-soranî dbêjin Erame ne wek me bilêv dikin(herame)*

# Ronakbîrî



Laleş Qaso

• Tarîxa ronakbîriyê kevin e. Ronakbîrî, ji wê roja ku insên aqilê xwe bi karaniye û berê xwe daye kayinatê de heye. Insên di xebitandina aqilê xwe de anatomiya xwe, ruh, made, sirûşt û tevgera wê nas kir. Insanên ku aqilê xwe dabûn xwedayan û bi aqilê wan xewdayan hov dijiyan, bi keda ronakbîran li xwe vegeriyane û insaniyet nas kirine. Ji ber ku ronakbîrî afirandina ilim, pêşketin û parastina ilim bû, û ilim jî bi ruhber, neruhber û kayinatê dadiket, barê ronakbîran jî giran dibû. Ilim, tu kelem di rêya xwe de qebûl ne dikirin û di rêya ilim de jî her tim kelemên herî mezin sekinîbûn.

Eha ji ber wê yekê bû ku ronakbîran jî her tim doza azadiyê kirine û ji ber wê azadîxwaziyê, ji bal civakê û desthilatdaran ve perçiqîne. Û pir bi hovîtî jî perçiqîne! Di vî warî de tarîxa ronakbîrên ewrupiyan pir bi xwîne! Insaniyet deyndarê liberxwedana wan e. Di demên koledariyê û feodalîzmê de belkî dibû ku siyaset ji bo ronakbîran ne tiştekî ewqasî girîng bû. Siyasetê bala wan ewqasî ne kişandibû. Belkî hin ji wan, wek hin ronakbîrên me ên îro ku bi carekê ve dev ji karên siyasî berdane û bi hin tiştên kulturî daketine, ewqasî tênegihabûn ku bi karên siyasî re reformên ilmî û kulturî jî pêk dihatin.

Di eslê xwe de her bidestxistineke doh e ilmî, mîna îro di kodika siyasetê re herikîbû. Aliman yan divabû bi desthilatdaran re li hevkiribana û yan jî qîma xwe bi kujtinê bianîna heta ku ilmê xwe biafirandana. Heger Skenderê pêşî rê nedaba Arîsto Teles û li pişt nesekinîba, wê Arîsto nikarîba ew aqilê xwe ê mezin hemû bi karbianiya û tesîra ilmê xwe bigihanda ebediyetê. Lêbelê mezinahiya aqilê gelek filozofên yûnanî wek Hypatia ku belkî ji Arîsto jî li pêştir bûn, hemû bi şûrên zaliman re berba bû. Heger ew aqilê wan jî mîna ê Eflatûn û Arîsto derbasî xwendegehan bûbaya, kî dizane belkî dinyaya me sed-du sed salekî ji îro li pêştir bûya.

Di çaxê koledarî û feodalîzmê de, insan hov bû, jiyana insên pêşmerde bû. Çerxa civakê giran dizîvirî, serdest û bindestan bêyî ku peymanan di nav xwe de deynin heta derekê li hev kiribûn. Heta derekê her kes ji jiyana xwe hinekî memnûn bû. Rewş ew rewş bû û wê rewşê jî hetanî qirnê pazdehan ajot. Di wê rewşê de pêwîstiyeke wilo mezin jî ne bi rola ku ronakbîrî derkeve pêş hebû û ne jî bi kirina rola siyaseta wan. Lê piştî ku barûd û pisûla keşif dibe û hema pê re bi sîlehên barûdên insan qira hev tînin, em dibînin ku ronakbîrî di hikmê sed salekî de tam derdikeve pêş û şoreşeke ilmî pêk tê.

Ilim bi qasî ku ser bi xwe bûye pêşketin ketiye her warî, ilim bi qasî ku di civakê de hatiye peyivandin û bala civakê kişandiye, pêşketin ketiye civakê û medeniyet xurt bûye. Bi wî ilmî ye ku qirnê şazdehan dibe meydana şerê pêşketîxwaz û paşketîxwazan. Di vî qirnî de bi şoreşa ilmî re dîtinên li ser xwezayê, dîn, îdeolojî û civakê ji binî ve tên guherandin. Ev qirn dibû destpêka kapitalîzmê. Di vî qirnî de ye ku êdî filozofên wek Frances Bakon (ingilîz e-1561-1626) bi temamî li dijî spekulasyonên felsefeya kevnare disekinin û filozofiya xwe di pratîkê de bi kar tînin. Yanî a wan dihat maneya ku êdî mirovê ronakbîr ji niha û pê ve, wê ne bi tenê bigota, divabû bikira jî.

Li gora wan, pêşketin bi zanahiyê dibû û zanahî jî ji bo bi serketina insaniyetê divabû bihata bikaranîn. Û ew hemû jî pêşî li ba ronakbîran hebû. Bakon hinekî din pêş de diçe û digihê we qenahetê ku heger ronakbîr bi siyasetê danekevin, yan jî bi temamî xwe ji siyasetê bêrî bikin, wê pêşketin neketa civakê. Li gora wî, bi mifta siyasetê derîyên herî asê vedibûn. Siyaset mivredeke ku hesin û pola dibirî. Ji ber wê bawermendiya xwe bû ku wî di parlamentoya ingilîzî de cih girt. Îcar gava mirov ji wan deman û heta ku digihê şerê Napolyon Bonapart, li tarîxa siyaset û pevçûna ku van ronakbîrên frensî kirine temaşe dike, mirov ji mêrxasiya wan heybet digire! Ez bi xwe heyranê jîr û zanahî û cesareta wa me!

## Li Hola Kongiran Semînarek Li Parastina Zarokan Di Cengan de

Navenda Kurdî Ya Lêkolîn û Rawêjkirinên Yasayî li bajarê Qamişlo Semînare li Hola Kongiran ji parêzer Şehnaz Şêxê re bi navê "Parastina Zarokan di Nerîna Yasaya Navdewletî û Mirovî di dema Cengan de" lidar xist.

Di semînarê de Parêzer Şehnaz li ser birotokolên navdewletî di vê derbabrê de, wek (Her çarên Cinêvê) axivî, û tekez kir ku beşdarkirina Zarokan di van engan de ne karekî yaysayî ye.



## Li Navenda Jina Kurd Ya Azad Semînarek Li Ser Ezîdiyan

Li Navenda Jina Kurdî ya Azad, li Qamişlo, Mamoste EbdilBarî Xelef endamê Komeleya Subarto roja Pênşemê semînarek li ser ola Ezîdiyan lidar xist. Di semînerê de behsa koka navê Ezîdîtiyê di gelek nerînan de kir, bi berfirehî li ser ola Ezîdiyan û hûrbîniyên vê olê û herweha pirtûka Celwe û Meshef jî sekinî, anî ziman ku ew û Zeredeştî herdu temam dikin.




## Desteya Rêvebir Di Yekîtiya Nivîskarên Kurd – Hesekê Civîna Xwe Ya Normal Lidar Xist

Desteya Rêvebir di Yekîtiya Nivîskarên Kurd – Hesekê civîna xwe ya normal di roja 24/8/2014an lidar xist. Di civînê de gelek xal hatin giftugokirin. Û civîneran erêkirinan xwe li ser biriyarên civîna berfireh ya Yekîtiya Nivîskarên Kurd ku li Qamişlo lidar ket anîn ziman.



## Yekîtiya Xwendevan û Lawan li Qamişlo Xula Derçûna 73 Rahêneran Bidawî Kir

Yekîtiya Xwendevan û Lawan "K" - Rojava, şaxê Qamişlo roja îniyê 22/ 8/2014an de, li navenda Yekîtiyê li Qamişlo, xula derçûna 73 rahêneran di warê zimanê Kurdî, dîroka Kurdî ya kevin, û tendirustiyê de bidawî kir. Yekîtiya Xwendevan û Lawan li gor berdevkê wê xwe dibînin li pêşiya berpirsiyariyek dîrokî ne, amade ne ku xuleyan jixwendevanan re di hemû warî de vekin.



www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpress@gmail.com
00905368908545
bûyer PRESS Nûçe Bi ... Zelalî

## Kanaleke Kurdî Nû Dest Bi Weşanê Dike

Hat ragehandin ku televizyonek Kurdî ya nûçeyan bi navê MED NÛÇE wê di demek nêzîk de dest bi weşana fermî bike.

MED NÛÇE dê bi hemû zaravayên Kurdî nûçe û bernameyên cuda cuda biweşîne. MED NÛÇE herwiha dê cîh bide bernameyên civakî, siyasî û hemû bûyerên Kurdistan û cîhanê.

Berî niha bi du mehan jî kanaleke din a mûzîkê bi navê MED MÛZÎK dest bi weşana xwe kiribû. Hêjayî gotinê ye, daraza welatê Danîmarkê di 3'ê Tîrmeha 2013'an de lîsansên kanalên Nûçe TV, MMC û Roj TV yên girêdayî şîrketa weşangeriya "Mezopotamya Broadcasting" betal kiribûn û bi 10 milyon Kronê Danîmarkî cezayê pereyan lê biribû.

Nûçe TV û MMC di 19'ê Tebaxa 2013'an de hatibûn girtin.

Frekansên MED NÛÇE:

## "Qêrîn" Çîroka Sînoran Vedibêje




Li ser nexşeya Kurdistanê sînor hatine kişandin ku her malbateke Kurd, her xizmek li aliyekî sînoran mane. Kurtefîlmê bi navê 'Qêrîn' qêrîna Kurdên du aliyên sînor ku Kurd parçe kirine nîşan dide. Kurtefîlmê 'Qêrîn' bi zimanekî cudatir ji berhemên din û bi awayekî serkeftî mijara xwe digire dest.

Hunermend Diyar Dêrsim û Bîlal Bulut derhênertiya kurte fîlmê "Qêrîn" kirine û bi giştî fîlm 14 deqe ye. Çîroka fîlm li gunedekî ser sînorê Bakurê Kurdistan û Ermenistanê, nêzîka çiyayê Agirî derbas dibe û jiyana malbatên Kurd vedibêje.

Ji ber ku li ser sînor axaftina bi zimanê Kurdî qedexe ye malbat têkiliya xwe bi dengbêjiyê saz dikin. Bûyeran bi stranan vedibêjin. Yek li wî alî dest pê dike, yê aliyê din didomîne. Û heta evîna du ciwanan jî rewş wiha didome.




## Kurdî Xweş e




| | | | |
|---|---|---|---|
| Arîşan | معوقات | Danîştin | جلسة |
| Ciyawaz | متناقض، مضاد | Serpêçî | تمرد |
| Wergirtin | استلام | Helwest | موقف |
| Sîxur | جاسوس | Berjeng | دليل |
| Pergal - Rêjîm | نظام | Neyênî | سلبي |
| Gotegot | إشاعة | Erênî | إيجابي |
| Danezan | إعلان، تصريح | | |

## Mamik ???

- Tişteki min heye,binî ax e,navê şax e,serî zêr e.
- Kaloyek tê,ji deştê,barê striyan li piştê.
- Tişteki min heye,her têm li mal e,geh şîrîn e, geh tahl e.
- Ga orî,pişkul firî.
- Ji şekirê şirîntire,ji hesinı gırantire.

Bersivên Hejmara 2an:
Name- Moxil- Mar- Firok- Nexşe







## XAÇERÊZ

**ASOYÎ:**
1- Komekşervan.
2- Yekjialiyan.
3- Yekjinijadan, agahiyek li serbûyerekê.
4- Şeh (bêdengdêr), wekhev.
5- Tersîdirêj, nerînêntûj.
6- Jipêdiviyênsopê ye (vajî), jibobersivdanê.
7- Lîsteyadermanankubijîşkdidenexweş.
8- Jirîtmênrêziman e.

**STÛNÎ:**
1- êweyekeberxwedanê ye.
2- Dêdibêje da kuzarokêrakevê.
3- Kurtkirina /ezjî/, ta (vajî).
4- Jiendamênlaş, jiendamênlaş.
5- PêxemberêberîMûsa, dezî.
6- Agahiyeknayêgotin, newe (belawela).
7- Baranji wan tê.
8- Bêaqil (vajî), li dûhev.

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | | | | | | | ■ |
| 2 | | | | | | | | |
| 3 | | | | ■ | | | | |
| 4 | | | ■ | | ■ | | | |
| 5 | | ■ | | | | ■ | | |
| 6 | | | | ■ | | | | |
| 7 | | ■ | | | | | ■ | |
| 8 | | | | ■ | | | | ■ |

### Hejmara Bûrî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | b | e | r | e | k | a | t | ■ |
| 2 | e | h | o | r | e | ■ | a | a |
| 3 | d | ■ | z | ■ | d | u | r | v |
| 4 | i | d | ■ | n | ■ | u | i | e |
| 5 | r | a | w | a | h | ■ | s | s |
| 6 | x | ■ | e | ■ | ■ | t | t | t |
| 7 | a | j | n | ê | ■ | a | a | a |
| 8 | n | i | s | ê | b | î | n | ■ |